

ANABASÎS

VEGERA DEH HEZARAN

ALÎ HUSEÎN KERÎM



Enstîtûya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst li Almanyaya

Navê Pirtûkê: Anabasîs Vegera Deh Hezaran

Amedekar: Alî Husein Kerîm

Şêwekar: Oana Bârleanu

Redekte: Muzaffer Avşar

Mîzanpaj: Dadil Xoçvanî

Nexşe: Ali Husein Kerim

Çapxane: NEXBOOK

Werger ji romenî ji bo kurdî: Ali Husein Kerim

Copyright © alihuseinkerim2015

“Ev pirtûk ji Xenofon, Anabasîs, Editura Ştiinţifică şi Enciclopedică, Cartea IV ve V, B.Z. 401 – 400, 1964 hatiye wergirtin”

Ev pirtûk, weşanek ji ya

Enstîtûya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst li Almanya ye.

Körnerstr. 94, 58095 Hagen

institutakurdi@yahoo.de

www.enstituyakurdi.com

ISBN: 3-930943-70-0



Pêşgotin

Anabasis (hilkişîn) eserek klasîk ya Xenophon e û bûyerên B.Z. 404'an ên Yûnan, Anatoliya, Mezopotamya jorîn û jêrîn destnîşan dike. Ev eser wek rojnivîsa Xenophon bi xwe ye. Bûyer, mêrxasên bûyeran dem û deverên di vê eserê de hatine nivisandin hemû jî rast in. Ji ber van taybetiyên objektîv, Anabasis, ji bo herkesî bi taybet ji bo kurda pirtûkek pir girîng e. Ji ber ku, di vê pirtûkê de yekser behsa navê Kurd û Kurdistanê tê kirin.

Xenophon, B.Z. 400î cihekî li dor û berê Atînayê ji dayîk bûye. Sedsala ku ew tê de dijiya, dema desthilatdariya Spartayê ye. Ew, rewşenbîrekî wê demê yê hêja ye. Hê ji dema ciwaniya xwe de bûye şagirtê fîlozofê nav û deng Sokrates. Diyare ku ew gelekî di bin hikara Herodots de jî maye. Lê belê di aliyê şîrovekirin û destnîşaniyan de şêweyên wî yên cuda jî hene. Berya her tiştî ew ne bitenê niviskar e, di hemen demê de him jî serleşkerekî jêhatî ye jî. Ji ber vê egerê ew, di nivisên xwe de digel agahiyên girîng, şîret û rênîşaniyan jî peşniyazî mirov dike.

Di Anabasisê de Xenophon behsa welatê Karduya ango Kurdiyayê dike. Bêşik, Xenophon di Anabasisê de behsa Medya, Ekbatan, Sûra Medan, Nînova, Kilîkya û gelek deverên dinê yên kurdnîşîn dike. Ew der hemû jî parçeyên welatê kurda ne. Lê belê ji ber ku piraniya wan cîh î waran hingê di bin destê persan de bûn, bala mirov zêde nakşînin. Diyare ku Kardûya, hingê beşek xaka azad a kurda ye.

Tiştê dinê ya ku di vê eserê de bala mirov dikşîne, gerdîşa "masiyên pîroz" in. Xenophon dibêje: "... *Piştî vê, Koroş di nava çar rojan de gihîşte çemê Khalos. Berahiya vî çemî sed nig in. Tê de masiyên pir mezin hebûn û ew*

*hînî mirovan bibûn. Xelkê Sûryayê¹ bi çavê xwedayan li wan masiyan dinyêrîn û wek kevokan, nedixwastin kes zirarê bide wan.*² Bi goreyî baweriya xelkê wê derê ew masiyên Aştarteyê ne.³ Çemê Khalos / Xalos, şaxekî Firat e û ne zêde dirêje. Dibêjin dikeve bin erdê. Her wiha, diyare Khalos/Xalos dor û berê Riha û herêma Rojava ye. Ev gerdiş paşê bi serhatiyên Îbrahîm Pêxember ve hatiye girêdan.

Diyare Xenophon navê “*kardu*” yan ji aşûriyan yan jî keldaniyan wergirtiye. Ji ber ku peyva “*kardu, kardo, karduya*” bi goreyî bilevkirina aşûrîkî ye. Heta îro jî aşûr bi kurdan re dibêjin “*kurdoyo*”. Bi Zimanê Êrmeniyên “*kurd*” yekjimar “*kordu*”, pirjimar jî dibe “*kordukh*”. Her wisa Xenophon jî ew bi têşeyê bilevkirina yewnanî nivisandî ye. Helbet ev nav hemî jî têşeyên bilevkirina biyaniya ne. Aşkereye ku Gelê Kurd ji hingê ve bi xwe re digotin kurd, navê welêt jî Kurdiya bû.⁴ Ji ber ku hê ji sedsala XVIII ya B.Z. welatek navê wê *Kurda* hebû. Ango jêre digotin welatê Kurda. Nivisarên derbarê welatê Kurda di “*arşivên Mariyê*” de hatiye keşifkirin.

Kurda, cînarê Andarîgê ye. Andarîg di Kurdiya Nûjen de bûye Andiwer û Dêrik, Andarîg him ji aliyê nav û him jî aliyê cografîk bûye du beş. [Andi(war) + Dêrig(k) = Anderik].

Mijar zelal e. Yanê ji hingê ve Welatê Kurda ji kendavê heya nîvê Anatoliyayê dirêj dibû.

Di dîroka Yûnan de şerê Peleponezê pir nav û deng e. Di encama vî şerî de Sparta ser dikeve û Atîna peymaneke rûsvabûyî dipejirîne. Hingê artêşa yûnanan bê ser û ber

¹ Sûrya, tê wateya nave welatê Huriyan û bi Zimanê Misrî yê kevn e.

² Anabasis IV., 9.

³ Aştarte, Xwedawenda Horiyan e. Jê re Îştar jî tê gotin.

⁴ Daçek a dawiya Kurdistanê –stan, ji dema Sasaniyan pêve heye.

dimîne. Hin ji wan dikevin bin sîbera satrabê (Waliyê) Persan. Satrabê persan yê hingê bi xwe jî birayê şahê Persan, Kyros / Koroşê Ciwan e.

Di Anabasîsê de Xenophon dibêje ku; du kurên şahbanû Parîsatîsê û şahê persan Dara hebûn. Navê yê mezin Artaxerxes, yê piçûk jî Koroş e. Piştî mirina Dara, kurê wî yê mezin Artaxerxes dibe şahê Persiyayê. Tisaphernes ku hevalê Koroş bû, bêbextiyan lê dike û dibêje Koroş hewil textê împaratoriye ji dest Artaxerxes bigre. Şah Artaxerses bi Tisaphernes bawer dike û tîne birayê xwe Koroş desteser dike û biryara sezaya mirina wî dide. Lê belê dayîka wan dikeve navberê û Koroş dide berdan. Piştî wê Koroş careke din vedigere eyaleta ku li wê satraptî dikir.

Koroş, ji bûyera girtina xwe gelekî xemgîn û posîde bibû. Ew ji ber mirinê filitîbû. Ji aliyekî dinê jî birayê xwe jî xeyîdi ye. Ji azadbûna zîndanê pêve xwast ji bindestê birayê xwe derkeve. Ji hingê ve destxistina textê şahitiya Persiyayê dihizirî. Dayîka wan Parîsatîsê ji Artaxerxes zêtetir hez ji Koroş dikir. Piştevaniya dayîkê jî bibû sedemeke wêrandina wî. Ji bo planên xwe bi cî bike bi lez ji xwe re dost û heval çêkir.

Ji bo desthilatdariya Artaxerxes nebût bike pêdiviya wî bi leşkeran hebû. Ji ber vê egerê wî yekîneyên yûnaniyan bi şêweyekî nehînî berhev dikir. Got: "*Tisaphernes dixwaze êrişî bajarên ku leşgergeh lê hene bike.*" Piştî vê plansaziyê gelek leşkerên jêhatî û pîspor xwe bi Koroş ve girêdan. Piştî kurtedemekî Tisaphernes, bi bahaneya ku ew hevalbendên Koroş in êrişî ser bajarê Mîletosê kir. Gelê Mîletosê bi tirsê kuştinê koçên xwe girêdan û çûn li cem Koroş. Koroş deriyê eyaleta xwe ji wan re vekir. Ev bûyer bû sedema ku gelek yûnanî bibin hevalê Koroş.

Koroş, bi bahana xelkê koçber vegeerîne cîh û warên wan, ji aliyê deryayî û hişkayî de havîrdorê Mîletosê dorpêç dike. Ji aliyekî dinê ji birayê xwe rica dike ku, Mîletosê bide wî. Ev hemû dibin çend bahane ji bo xwe arteşekî durust bike. Şah qet caran bi vî tiştî şik nedibir. Ji ber ku Koroş, bacên bajarên nûdestxistî yên Tissaphernes jî bi şah re dişand.

Koroşê Ciwan, arteşeke dinê jî li Keheresonesê lihev dicivand. Klearkosê ji Lakedamonyayê ji welatê xwe mişextê Keheresonesê bibû. Bi hevdîtinekî de Koroş wî pir dicibîne û ji bo leşkeran berhev bike dehhezdarikan⁵ didê. Her wiha, Koroş, bi bahaneya şer û cengên dor û berên eyeletê ji bo xwe arteşekî durist dike.

Koroş dixwast artêşê ber bi rojhilat bimeşîne. Ji bo şah şik negire, berê her tiştî êrişî li ser Pisidiyayê⁶ kir. Her wisa artêşa wî ber bi rojhilat meşiya. Koroş hêzên xwe yê mezin li Sardesê⁷ komî li ser hev kiribû. Lê belê hevrikê Koroş, Tissaparnes hemû liv û hereketên wî dişopand. Bala xwe dayê hejmara artêşa Koroşê Ciwan ji bo êrişa Pisidiyayê pir mezine. Ango ji bo tişteki wisa pêdiviya hewqas serbazan nîne. Wî hîlebaziya Koroş fêhmkir û bayê bezê xwe gihande Şah. Êdî planên Koroş eşkere bibûn. Dema planên koroş derehî dibe, şah jî leşkerê xwe ji bo berevaniyê cî bi cî kir.

Koroş bi bahaneya êrişkirina Pîsîdiyayê her ber bi rojhilat ve diçû. Heya hingê haya yunaniyan jî bi armanca bingehîn ya Koroş çênabe. Wan wêtrê ew dixwaze sînorên satrabiya xwe berfireh bike. Hinan jî digot ew ji bo şah şer dike. Dema arteş dighêje Tarsûsê, haya yunaniyan li vê yêkê çêdibe û naxwazin êrişî artêşa şah

⁵ Darik, navê diravên Persiyayê hingê ye.


⁶ Isparta û dor û berên Konya, Bûrdûr, Afyon û Antalyayê.

⁷ Manisa, Salihli


bikin. Lê belê Koroş, mûçeyên wan zêde dike û her wê hingê Hêza ku Klearkus femandariyê dike (Xenophon jî di nav wan de ye) biryara êrişkirina li ser şah dipejirîne.

Wek di Anabasîsê de jî hatiye diyarkirin, di şerên desthilatdariyê de rola hîlebazî, propaganda, mîjokatiya hestyarî û pere dayîn karê rojane ne.

Hêzên Koroş û yên şah li Kunaksayê⁸ dest bi şer kirin. Di nav şer de Koroş dixwast yekser erişî şah bike û wî bikuje. Her wisa jî dike. Bi rimê li sîngê şah dide û wî birîndar dihêle. Lê di wê kêliyê de rimeke kinik bin çavê wî dikeve û ew jî birîndar dibe. Piştî kurte demekê ew û heyşt alîkarên wî li pey hev di qada şer de tîn kuştin. Dema ku leşkerên yûnanan kuştina Koroş dibîzin ew jî dixawazin ji paş ve vegerin û herin welatên xwe. Her wisa serenca 10.400 serbazên yûnanî li çiyayên Kurdistanê hingê dest pê dike. Xenophon bi xwe jî yek kes ji wan serbazan bû.



⁸ Kunaksa, dor û berê Bexdayê ye. Dibe ku navê wê bi kurdî Qonaxşa be.



ANABASIS

Pirtûka III. Beşa pêncemîn

1. Her wiha, dema ku yûnaniyan lûtke zeft kirin, barbar reviyar çûn. Yekîneyên Tîssaphernes û yên Arîaios, ji rêyeke din re ji paş ve vekîşyan. Yekîneyên Khîrîsophos jî, ji jora gir daketin jêrê û li gundekî qût lê zêde konên xwe vegirtin. Di vê deştê de sertaserê beravên Çemê Dîcleyê gelek gundên dewlemend hebûn.
2. Piştî nîvro dujmin ji nişka va li deştê xuya kir û çend kes ji yûnaniyên ku ji bo talanê belav bibûn hatin kuştin.
3. Paşê, Tîssaphernes û peyayên wî dest pê kirin gundên wê hêlê şewitandin. Şewat bibû sedema xemdariya hin yûnaniyan ji ber ku ditirsiyan bê qût bimînin.
4. Serbazên Khîrîsophos ku alikariya hevalên xwe dikirin veşeriyar artêşgeha xwe; Xenophon hingê nû ji çiyê daketibû. Ew li ser piştê hespê xwe kete nav du rêzên serbazan û bi serbazan re wisa got:



5. <<Ey yûnaniyan! Wek hûn jî dibînin wan welatê xwe ji me re berda ye. Qey dibêjin ev der welatê me ye. Dema ku bi me re peyman girêdan, di-xwastin merca neşewitandina erdên şah bi me bidin pejirandin; Hal ew e ku, wek erdê dujminan ew bi xwe dişewitînin; Lê belê ew qûtê xwe li ku daynin emê jî li wê derê derkevin li pêş wan.>> Berdewam kir û got:
6. << Khirisophos! Ez pêşniyaz dikim ku ev der mîna ku welatê me ye, divê em êrişî agirberdêran bikin.>> Khirisophos bersiv da got: <<Ez ne li ser wê hizrê me, em jî bişewitînin; her wisa em dikarin koka wan asan biqedînin.>>



7. Piştî vegeriyar cihên konên xwe lê vegirtine, serbaz jî bi karên xwarinê re mijûl dibûn, hingê fermanadar û serpêl li hev civiyan. Rewşa wan gelekî xirab bû: Ji aliyekî çiyayên bilind, aliyê dinê jî çemekî ku rim naghîje binê we hebû.



8. Ji nav xemdarî û metel mayîne de nizanibûn çî bikin. Her li wê demê yekî ji Rodosê gihîşte hawara wan û got: <<Birêzan! Eger hûn amûrên pêdivî û talantonekî bidin min⁹, ezê çar hezar piyadeyê giran yek derbî derbasî aliyê din yê çem bikim.>>
9. Pirsî pêdiviyên lê kirin û wîjî got: <<du hezar meşk gerek in.>> <<Ez li vir gelek pez, bizin, ga û guhdîrêjan dibînim; eger em çermên wan bigurin û wan binepîxînin bi asan derbasdibin aliyê dinê.
10. Ji bilî wan divê qayîşên hespan jî bidin min; ezê meşkan bi hev ve girêdim; paşê hesinan bi serê wan ve bikim û mîna kulbeyan bavêjim avê; meşkan bi kendalên her du aliyên ve pêt dikim; gurzên çiloyê davêjim ser meşkan û di dawiyê de xwalyê li ser didim reşandin.
11. Di rewşeke wisa ti kes noqî bin avê nabe, çilo û xwalî jî nahêle şimitandin çêbe.>>

⁹ Talanton, beramberî 6000 drahmîyê yûnanî yê kevn e.

12. Femandara hizra wî tişteki jîrekane pesend kirin, lê belê paşê bala danê ku ew wisa kareki asan nîne; ji ber ku li aliye dinê ye çem siyariyên dujmin hebûn û nahêlin ew derbasbin.



13. Roja dinê artêş her çi gundekî xwe gihandê şewitand û paşê jî berê xwe da gundên hêla Babîlê yên neşewitî. Ji ber vê sedemê dujmin nêzikî wan nedibû; bi şeweyekî şaşwaz meşa wan dişopandin. dixwastin bizanibin gelo çi planên yûnaniyan hene û dê bi ku de herin.
14. Wê hingê serbazan dest bi amadekirina xwarinê kirin, femandaran jî ji nûve civatek lidarxistin û çend kes ji dîlên şer anîn li pêş xwe. Hin agahî der barê heremên dor û ber ji wan wergirtin.
15. Bi goreyî gotinên dîliyan rêyên aliye başûr diçin welatên Babîl û Medyayê, rêya ber bi rojhilat diçû Sûsa û havîngeha şah Ekbatanê, eger bikaribin çem derbas bin ji rojava re diçine Lîdya û Îyonyayê

û eger çiyayên bakûr hilperin dikarin bigêhêjin welatê kardûkan.

16. Gotin ev gel nîşteciyan çiya ne, şervanên zîrek in û girêdayî şah nînin. Hetta dibêjin, carekî ji bo zeftkirina wê derê şah artêşek hejmara wan digîhîşte sed û bîst hezar serbazan şandibû li ser wan. Lê belê hate zanîn ku ji wan serbazan qet yek jî sax nefilitiye. Digel vê jî, naha kardukî bi satrabên deştê re hevhatî ne; têkiliyên her du welatan bi hev re hene.
17. Piştî ku fermanbaran ev agahî wergirtin, dîlên ku digotin filan rê ji filan derê re derbas dibe, ji yê dinê cuda kirin; lê wan, divê ji ku derê re herin negotin. Hizra çûyîna ji çiyayê re û ya welatê kardûkiyan ketibû serên fermanbaran. Ji ber ku dîliyan gotibûn ku eger ji welatê kardûkiyan derbas bibin, ew dighêjin Ermeniyayê, ku eyaletekî ajawê û dewlemend e û rêvebirê wê jî Orantas e. Ji wir wê de bi şêweyekî asan di ku de dixwazin dikarin biçin.
18. Fermanbar ji bo saeteke guncav dest bi meşê bikin boraq şerjê kirin; tirsaw ew bu, ku dujmin beriya wan bikaribe derbasbokên çiyê dagre. Ji ber vê sedemê ferman dan ku serbaz bila xwarina xwe bixwin, barên xwe amade bikin û bi îşareta destpêkê li pey wan bimeşin.

PİRTÛKA ÇAREMÎN

I

Yûnanî dikevin welatê kardûkiyan. Dema kardukî êrişî wan dikin, ji ber sedema barên giran serbaz nikarin bilez bimeşin. Ji ber vê barên xwe yên giran davêjin. Dighîjin ber derbasgehek ku kardoxî lê ne. Dîlekî şer wan vedigerîne. Sazkirina mufrezeyeke nû.

1. (Di beşên beriya vê de behsa bûyerên heya şer qewimîne, behsa peymanê şah û yûnaniyan, der barê betalkirina peymanê ji hêla Şah û Tîssap-hernes û êrişên artêşa persan dijî yûnaniyan hatiye kirin.)
2. Ji ber ku yûnanî ghiştibûn devereke Dîclêyê fireh û kûr nikaribûn derbasî aliyê dinê bin, ji ber çiyayên asê yên Kardûkyayê berçem berçem jî nedikaribûn biçin. Ji ber van sedeman ferman-daran biryar dan ji çiyayên re herin.
3. Dîliyên şer gotibûn piştî hilperîna çiyayên Kardûkyayê ew dikarin xwe bigihînin serokaniyên Dîclêyê yên li Ermenîstanê û eger bixwazin ê ji dora wan serokaniyan re jî vegerin. Ji bilî wê agahiyên nezîkbûna kaniyên Dîcle û Firat jî wergirtin.
4. Welatê Kardûyan wisa dagir kirin: Him nêta xwe ji wan vedişartin, him jî biryar dan ku ji wan leztir derbasokan bixin destê xwe.
5. Ji bo deştê hê tarî li erdêye di derbas bibin, çaxê nobeda şevê ya dawiyê fermana rabûnê hat dayîn, ew meşiyayên û berbangê ghiştin çiyê.
6. Khirisophos tevî gurdana xwe û hemû serbazên bi çekên sivik li pêş hemûyan diçûn. Xenophon tevî

dimdar û paşingan dimeşiya. Leşkerên bi çek sivik li cem wî qet tune bûn. Ew, bi tevî leşkerê giran ê piyade ve li paş hemû kesan bû; Wan hizir dikirin ku di rêya çiyayî de êrişî paşingan nayê kirin.

7. Bê ku dujmin bizane, Khîrîsophos xwe gihand derbasoka çiyê. Paşê hêdî hêdî pêşde çû; Leşkerên mayî hemû li pey wî dimeşyan, diketin nav gundên piçûk ên di newal û li ber tewangeyên çiya de hatibûn avakirin.
8. Ji ber vê kardûkiyan gundên xwe vala kirin û bi tevî jin û zarokên xwe derketin bilindciyan. Di gundan de xwarin mişe bû; di malan de jî amanên tûncî pir zêde bûn. Yûnaniyan qet yek ji wan hilnedan û gundî jî neşopandin. Ji ber ku dizanibûn ku ew dujminê şah in, bawer dikirin ku wê bi şêweyekî aştiyane ji welatê wan re derbas bibin û herin.
9. Lê belê her yekî çî xwarin dest wan ket hildan, bêguman pêdiviya wan gelek xwarinê hebû. Her çiqasî bang li Kardukiyan kirin kesî ji wan bersiv neda û çî îşaretên aştixwaziyê jî eşkere nekirin.
10. Heya serbazê yunaniyan yê dawiyê ji çiyê daket bibû êvar; Ji ber ku rê hewqasî tenge ku hilkişandin û daketina çiyê li ser hev rojekî kişand. Di wan kêliyan de komeke karduyan ji paş ve êrişî wan kir û çend serbaz kuştin, çend heb jî bi kevir û tîran birîndar kirin. Hejmara karduyan ne zêdebû, ji ber ku yûnan ji nişka ve hatibûn û bê agadarî ketibûn welatê wan.
11. Eger hejmara wan zêdebûya dikaribûn beşeke mezin a artêşê nebût bikirana. Yûnaniyan wê şevê di nav gundan de leşkergeha vekirî damezrandin.

Kardukiyan jî wek çemberekî çiyayên dora wan agir dadan û bi wî agirî hev û du agahdar dikirin.

12. Sibê zû berbangê fermanदार û sitvan civiyan, biryar wergirtin. Angoreyî vê biryarê yê tevî xwe bitenê ajalên barkêşiyê yên xurt û girîng bibin, divê dîliyan jî berdîn.
13. Ajalên barkeş û tiştên giran tempoya meşa wan hêdîtir dikir û gelek serbaz ji ber parastina wan beşdarî şer nedibûn. Ji ber piraniya dîlên şer du qat qût dihat mezaxtin. Her wisa bi rêka bangêran ev biryar di nav artêşê de belav kirin.
14. Piştî xwarinê meşê dest pê kir; lê belê li peş derbasokên teng fermanदारan serbaz didan sekandin, tiştên li ser wan biryara qedexebûnê hebûn ji wan distendin. Serbaz dijî wê biryarê nedisekinîn: Lê belê dîsa jî hin jinên ew evîndarê wan bûn, yan jî zarokên bedew bi dizî ji derbasokê re dibirin. Wê rojê car caran şer çêbû, hin caran jî bêhna xwe vedan û wisa ji pêş de çûn.
15. Sibetirê bagerek mezin dest pê kir; lê dîsa jî diviya pêşde herin; xwarina wan kêmbû. Khîrîsophos femandariya yên pêşiyê, Xesenofon jî yê dimदारan dikir.
16. Êrişek mezin hate ser wan; ji ber ku cihê êrişê gelekî teng bû, êrişkeran kevir û tîr dibarandin ser yûnaniyan. Dema ku yûnaniyan êrişî wan dikir, hingê jî meşa wan giran dibû. Ji ber ku dujminan bi dijwarî êriş dikirin, Xenophon pir caran xeberên sekinandinê dişand li pêş.
17. Khîrîsophos, her cara ku jê re digotin raweste ew disekinî; lê wê rojê şûna bisekine xwast bi lez pey wî bimeşin. Hin tişt diqewimîn, lê belê ji bo

sedema wê bizanibin wext tune bû; ji ber vê dimdar bi şêweyê bazdanê dimeşyan.

18. Di vê navberê de tîrekî zirxê ji çermê gamêşê yê Kleonymosê Lakoniayî qul kir û ew birîndar xist. Her wiha ew û Basîasê ji Arkaîdayê ku serê wî qelişandibûn her du jî mirin.
19. Xenophon dema gihêşte cihê bêhnvedanê, derhal çû ba Khîrîsophos, ji bo ku hêviya wan nesekiniye û di şer de alîkariya wan nekiriye ew rexne kir û got: <<me du serbazên xwe yê qehreman winda kir û me nikaribû em termên wan jî tevê xwe bînin.>>
20. Khîrîsophos, <<bala xwe bide van çiya, buhurandina wan çiqasî dijware bi çavên xwe bibîne,>> <<ji bilî vê rêka asê ti rêyên dinê nînin; ha li ser vê rêkê yê ku deriyên diparêzin jî dikarî bibînin.>>
21. Ji ber vê egerê ez hêviya te nemam û bi lez çûm. Min xwast beriya ku dujmin derbasokê bixin destê xwe ez bigihêjim li wê derê. Jixwe rênîşandarên me jî dibêjin ku ji bilî vê, ti rêyên din tune ne.>>
22. Xenophon got. <<min ji du kes dîl girtin,” “dema dujminan em nerehet dikirin me defikek danî; ev bû sedema hinekî bihnvedana me; me ji wan çend kes jî kuştin. Ji bo rênîşanvanên van deran dizanin hebin, em gelekî pêdaketin ku çend kesan zindî bigrin.>>
23. Derhal du mirovên dîlgirtî anîn û ji wan pirs kirin û gotin: gelo ji bilî vê rêkê ti rêyên din dizanin yan na? Xema yekî ji wan tune bû, ji gefan netirsî û wî çî agahî jî nedan. Gava wî agahî nedan ew li pêş çavê yê din şerjê kirin.

24. Yê dinê, got: ji ber ku qîza hevalê wî di wî gundî de jina yekî ye lewma nexwast agahiyan bide. Go ew ê rêyeke ku dikarin ajalên barkêş jî tê re derbas bikin nîşanî wan bide.
25. Paşê jî wî pirs kirin, gotin li ser wê rê deverên dijwar derbas bin hene yan na, wî jî go girek heye, heya li wê derê zeft nekin nikarin derbas bin.
26. Ji ber vê gazî sitvanên piyadeyên sivik kirin û der barê rewşa heyî de agahî dan wan, paşê jî biryara peydakirina kesên jidil wê derê re derbas bin wergirtin.
27. Berê, Arîstonymosê ji Methydrîonê û Agasîsê Stymphalosa Arkadiyayê derketin pêş. Paşê dîsa ji Arkadiyayê Kallîmakosê Parasîayayî xwe pêşniyar kir û got: “eger ez bibim fermanîdar, bawer dikim ku dê gelek serbazên ciwan mînekarî beşdar bin.”
28. Paşê pirs tevîbûna femandarekî serbazên çek sivik kirin. Arîsteasê Khîlosê xwe da pêş: di rewşê wisa girîng de ew pir kêrhatî bû

II

Mînekar ji rêyeke nehînî re xwe dighînin derbasokê. Lê belê Xenophon bi tevî baran ew dişopand, gelek caran kete nav şer û gelek serbaz telefîn. Bi dujmin re dikevin nav dan û stendinê

1. Nêzikî êvarê serleşkeran piştî xwarinê fermana çûna mînekarî dan. Mirovê dîlgirtî girêdan û teslîmî wan kirin û gotin derbasokê bixin dest xwe û heya sibê li wê bimînin. Berbangê, bi dengê borîzanê îşaretan bidin, paşê ji bilincihan re êrişî

- dujminên ku derbasok asê kirine bikin. Divê artêş jî heya dikare bilezîne û alîkariya mînekaran bike.
2. Piştî hildana vê biryarê mînekarên ku hejmara wan du hezar kes bervî derbasokê rêketin. Baranek pir dijwar dibarî. Xenophon jî berpîrsiyariya dimbar û paşingan dikir, ji bo dujmin hebûna mînekaran seh neke ew jî ber bi derbasokê dimeşiya.
 3. Dema ku yên dûmahîkê ji bo bigihêjin derbasokê hatin li ber çemekî, barbaran ji jor ve zinarên qasî erebeyekî dagrin hol dikirin ser wan; zinarên gêrkirî dema ku latan diketin parçe parçeyî dibûn û wek kevirên qanîkê dipekiyan; jixwe ti kesekî nikaribû nêzikî deriyê rê bibe.
 4. Hin sîtvanan lê nihêrin nikarin ji wir derbas bibin, hin cîhên din re xwe ceribandin; heya şevê koşîş dan, di dawiya dawiyê de bi armanca şîvê ji paş ve vekîşiyên; dimdaran heya êvarê çî tişt nexwaribûn. Jixwe dujminan şev heya sibê kevir gêr kirin.
 5. Mînekarên ku rênîşandar li cem wan bûn, êrişî nobedarên dora agirekî rûniştibûn kirin; hin kes ji wan kuşt in, yên dinê jî reviyên. Mînekarên wêtrê derbasok kirine bindestên xwe, her li wê derê kozik vedan.
 6. Hal ew e ku ew der dest nexistibûn; ji ber ku girekî dinê ji ser wan re hebû, karduyan heya li ser wî girî rê asê kiribûn. Lê bilî wê rê, yeke dinê jî digihîşte li ser ya ku dujmin asê kiriye.
 7. Şev li wê derê buhurandin; dema tîrêjên rojê biriqîn, wan bi şeweyekî kerr û lal êrişî ser dujminan kir. Ji ber ku mij hebû ew bê ku bînin dîtin karibûn nêzikî wan bibin; dema ku gihîştin menzîla hevdîtinê borîzan lê dan. Qîrîniya cengê ya

yûnaniyan bilind bû û êriş birin li ser neyaran. Ji ber ku barbar hêviya wan nebûn, dev ji rê berdand û reviyar. Ji wan pir hindik kes mirin, ji ber ku ew mirovên gelekî çalak in.

8. Dema ku yekîneyên Khîrîsophos dengê borîzanê bihîstin derhal êriş birin li ser rêya ku tê dîtinê. Her serleşkerêk bi goreyê rewşê deverên cuda cuda re dimeşyan; serbaz ji tehtan re hildikişyan, yek û du bi nîzeyan ve dikişandin jor.
9. Beriya hemû kesan, ew gihîştin li cem mînekarên ku senger bi dest xisitine.

Xenophon bi tevî nivê paşber û dû rênîşandaran pey wan dimeşya; ji ber ku ew rê ji bo ajalên barkêş guncavtir bû; nivê paşberan li pey ajalên barkêş dihatin.

10. Pêşde çûn û gihîştin ber girekî; ew gir di destê dujmin de bû. Diviya yan êrişê dujmin bikin û wê derê ji destê wan derxin, yan jî ji yûnaniyên din biqetin. Dikaribûn ji rêya dinê re xwe bighînin yûnaniyên din, lê belê ajalên barkêş dikarin bi tenê wê rêkê re derbas bin.
11. Ji ber vê sedemê yûnaniyan pesnên hev û du dan liq bi liq êriş birin ser wî girê, lê ji bo dujmin bikaribe bireve ew der dorpêç nekirin.
12. Dema ew bi goreyê derfetên xwe dixwastin hilkişin jorê, barbaran kevîr û tîr davêtin wan; lê gava ku lê nihêrin yûnanî nêzikî wan dibin dev ji girê berdand û reviyar. Yûnaniyan bala xwe danê ji bilî girê ku kirine bi destê xwe yekî dinê jî heye, biryara êriş birina li ser wê derê jî dan.
13. Xenophon hizirî ku eger girê dest xwe xistî nikariba biparêze yê ew der car din bikeve destê dujminan û ewê jî di rêya teng de êrişê baran bikin.

Ji ber vê sedemê Kurê Kephisoponê ji Atînayê Amphîkrates û Arkhagorasê ku ji Argonê hatiye mişextkirin li wê derê hişt. Wî bi xwe jî tevî serbazên mayî êriş bir ser girikê din û ew der jî zeft kir.

14. Girikekî sisemîn yê pir asê mabû; ew gir ji ser yê ku mînekaran bi şev dest xwe xistibûn re ye.
15. Dema ku yûnanî nêzikî wê derê bûn dujminan ew der bê şer berdan, yûnanî metal man; ji tirsê dorpêçkirinê ew der valakiribûn. Lê, dema ji jor ve jêrê nihêrîn, dîtin ku kardû êrişê li ser paşdêran dikan.
16. Xenophon, got: bila serbazên ciwan derkevin ser lûtkeyê gir û bêjin yê pêş bila hêdî bimeşin, ta ku yê paş bighêjin wan, divê dema ku ew gihîştin zozanan rawestin.
17. Di wê hengamê de Arkhagorasê Atînayî ku ji mirinê filitiye hat wê derê. Bi gotina wî, piştî girik dikeve destê dujmin, Kephîdoros, Amphîkrates û her çî kesên nikaribûn xwe ji tehtan re bavêjin hatibûn kuştin.
18. Piştî vê serkeftinê barbar hatin û li ser cihekî ji girikê wan bilindtir cîh girtin. Xenophon bi alîkariya wergeran bi wan re agirbes çêkir, xwast termên miriyên xwe kom bikin.
19. Barbaran gotin, eger malên wan neşewitînin ewê termên serbazên wan bidin wan. Xenophon gotina wan pejirand. Beşê dinê yê artêşê jî derbas dibe û dema hevdîtina destpêkê hemû hêzên dujmin yê wê heremê hatibûn.
20. Dema ku yûnanî ji bo cihê qonax vegirtinê kom bin li ser hev, ji gir dadiketî jêr, dujmin jî bi hêz û

hengameyek mezin pêşve çû; Piştî ku gihîştin li ser lûtkeyê girikê ku Xenophon lê ye, kevir gindirandin li ser wan. Di vê radeyê de çîpa serbazekî şikest, serbazê ku mertalê Xesephones digirt reviya.

21. Lûsoyê ji Arkadiyayê hate hawara Xenophon; bi martalê xwe him xwe û him jî ew parast û her wisa ji paş vekişyan. Beşa dinê ya paşberan jî gihîşte artêşa ku xwe ji bo şer amade kiriye.
22. Her wisa hemû artêşa yûnaniyan komî li ser hev bû; li wir di malên xwaşik û bi xwarinê dagirtî de man. Şerab pir zêde bû û ew di sarnicê sewaxkirî de diparastin.
23. Xenophon û Khîrîsophos, bi Kardûiyan re peymanek çêkirin û miriyên xwe kom kirin; li beramberî vê jî rênîşandar dan wan. Bi radeya derfetên tédane pêş miriyên xwe rêz girtin.
24. Dujmin her dem him şer dikir û him jî derbasok dadigirtin û rêya wan dibirîn.
25. Dema rêya pêşengan dihate birîn Xenophon fitlonekî diçû û hêlên bilintir ji yên ku rê xitimandine re derbas dibû. Her wisa dikaribû rê veke.
26. Eger êriş bihata ser pêşberan, Khîrîpos jî heman taktîkê Xenophon pêk dihanî. Ew jî fitlonekî diçû û der dikete bilindciyan û her bi vî avayî rê ji bo paşberan vedikir; bi vî avayî bi tesîr dikaribûn miqatî hev bibin.
27. Car caran ewên derketibûn bilindciyan dadiketin jêr, barbaran zîyan didan wan; Ji ber ku barbar hewqasî çalak bûn ku di nêzik de jî dikaribûn bifilitin û xwe xelaskin. Seranser ji bilî kevan û berkanîkê çekên din di destên wan de tunebûn.

III

Yûnanî gihîştin berava Kentrîtesê, ku ew der di navbera Kardûkiya û Armenyayê de sînore; her wiha, ew di navbera Karduk û Armenan de dimînin. Xenophon devereke derbasbûnê ya çem peyda dike, balxapînokiya siyarên armenan pêktîne û her wisa dikarin ji avê re derbas bibin. Xenophon êrişî ser Kardukiyan dike. Ji bo çem derbas bin bayê bezê vedigerin.

1. Yûnanî wê rojê li gundên deşta ber çemê Kentrîtes leşgergeha vekirî saz dikin; berahiya vî çemî du sed pî ye, ev çem, Kardûkiya û Armenyayê ji hev cuda dike. Dema ku çavên yûnaniyan bi deştê ket pir kêfxwaş bûn. Çem şeş yan jî heft stadiyonan¹⁰ dûrî çiyayên Kardûxiyayê bû.
2. Êdî xwarina yûnaniyan jî hebû, dema ku bobelatên li çiyayên Kardûkiya dihanîn bîra xwe li vê deştê pir kêfxwaş bûn. Ji ber vê leşgergeha vekirî damezrandin. Ji ber ku, ji heft rojên ku ji Welatê Kardûyan re derbas bibûn, qet yek roj jî bê şer derbas nebibû. Bobelatên li wê derê hatibû serê wan, ji yên şah û Tîssaphernes zêdetir bûn. Êdî ji wê xwe xilas kiribûn û dikarin birehetî razên.
3. Dema roj hilat, lê nihêrîn aliyê dinê çem siyarên bi çek û rext, pişt siyaran jî piyade rêz bûne û ta ku nehêlin ew derbasî Armenyayê bibin.
4. Ew, leşkerên bi pere yên di bin fermana Orontas û Artûkhas'ın û ji gelên Armen, Mard û Xaldîya ne. Dibêjin yên dawiyê (Xaldî AHK) gelekî azad û pir dilawêr in; bi martalên ji biya qufikan û rîman hatibûn bi çek û rextkirin.

¹⁰ Navê pîvana dirêjîyê ya yûnana kevnar e.

5. Girên li ser rêzbûne sêsed yan jî çarsed piyan ji dûrû çem bûn; rêyek tenê diçû li wê derê û diyare ew jî, ji hêla mirovan hatiye çêkirin. Yûnaniyan xwastin ji wê derê re derbasî aliyê dinê bibin.
6. Dema xwastin derbasbin, lê nihêrîn av dighêje heya ber sîngê wan; binê avê çal û kortik in, bi kevrên şimotek dagirtî ye; heya martalên wan roda neçe nikarin derbas bin; dema martalan bidin ser serê xwe vê carê jî hember tîr û tiştên dinê dipekin xwe nikarin biparêzin. Ji ber van sedeman ji paş ve vegeriyan, lewre derbasbûna çem gelekî bimişûr bû. Vê carê hema li beravê leşkergeha xwe vedanîn.
7. Şevêkî beriya wê hingê li çiyayê nêzik gelek kardûkiyên çekdar dîtibûn. Ji aliyekî mirovên nahêlin ew derbas bin, ji aliyê dinê jî tîrsa karduyan hebû. Ditirsiyan ku kardûyî ji paş ve êrişî wan bikin.
8. Wê rojê û şeva tê neçar li wê derê man. Xenophon xewnek dît, di xewnê de nigên wî qeydkirî ne, paşê ew qeyd ji xwe berê vedibin û ew difilite, bi gavên dirêj bi kêfa dilê xwe dimeşe. Nêzikî berê sibê diçe cem Khîrîsophos, xewna xwe bi wî re vedibêje û wê xewnê xwaşbîniyekî şîrove dikan.
9. Khîrisophos gelekî şa dibe û berbangê pêş çavên hemû fermanbaran boraqan dide şerjêkirin; hemû roviyan boraqan îşaretên başiyê didan xûyakirin.¹¹ Fermanbar û sîtvanan fermana bi hev re xwarina taştê dan.
10. Dema ku Xesophon taştê dixwar du ciwan bi lez hatin cem wî; ji ber ku her kesî dizani bu ku ji bo

¹¹ Wê hingê bi nêrîna roviyên boraqan remil/fel davêtin.

der barê şer her kingê dixwazin dikarin biçin li cem wî.

11. Ciwanan gotin ku dema wan ji bo vêxistina êgir çiloyên hişk digeriyan dîtine ku, wî aliyê çem mirovekî kal, jinek û keçek tiştêkî dişibiya tûrekî xistin qewêra tehtan.
12. Dema ew mirov dîtin, dibêjin diyare siyarên dujmin nukarin xwe bigêhînin li wê derê, hingê ew dikarin bi ewle derbasî aliyê dinê bibin; ji bo vê xwe tazî kirine, xençerek tenê hildane û xwastine bi avjênî derbasî aliyê dinê bibin. Lê av digihêje heya ber çokên wan û ew bi hêsanî derbas dibin; paşê cilan xwedikin û vedigerin.
13. Xenophon derhal xwast şerabê bidin ciwanan û ji ber xewna wî ji bo xwedayên ku cihê derbasbûna çem nîşan daye dîrozan bixwînin. Piştî dîrozan ciwan birin li cem Khîrîsophos, tiştên dîtine ji wî re jî vedibêjin. Khîrîsophos jî piştî wan guhdar dike ayîne pêk tîne û dîrozan dide xwandin.
14. Piştî ayînan fermana berhevkirina baran dan serbazan û ji bo derheqê derbasbûna çem, şikandina dujminê hember wan û astengkirina êrişên ji paş ve bişêwrin gazî serleşkeran kirin.
15. Khîrîsophosê bi tevî nivê artêşê pêşde here û ji çem derbas be, Xenophon û nivê din yê artêşê di vî aliyê çem bimînin, ajalên barkêş û parasvanên wan jî dê navberê re derbas bibin.
16. Piştî biryara hemû tiştî bi tekûz hildan, dest bi meşê kirin; Her du ciwanan, çem dikete aliyê wan ê çepê rê nîşandarî dikirin; cihê ku diviya jê derbas bibin kêm û zêde çar stadionan dûr bû.

17. Dema artêş dimeşiya liqên dujmin jî hêlîpaniya wan dimeşyan. Dema gihîştin cihê derbasokê û beravên bilind yê çem artêş rawestiya û Khîrîsophos zerzengek da serê xwe, xwe tazî kir, çekên xwe welgirt û ferman da go; hemû kes wek wî bikin; ji pey re ji sîtwana re go; bila liqên xwe bikin yekrêz, beşek ji aliyê wî yê çepê, beşek jî aliyê rastê wî bişopînin.
18. Di wê kêliyê de berbêjan boraq serjê dikirin, dujminan jî tîr û kevir dibarandin ser wan; lê ew hê nedigihîştin wan.
19. Dema remilên boraqan sûdewar der diketin, hemû artêşê bi hev re stranên serkeftinê digot û diqîriyan; digel vê qêriniyên zîz ên jinan jî dest pê dike, ji ber ku di nav artêşê de gelek gandêr jî hebûn.
20. Khîrîsophos tevî leşkerên xwe kete nav avê. Xenophon tevî serbazên herî çalak derhal çû li pêş derbasokên çiyayên Armenyayê: Dixwast dujmin bihizire ku ew dixwazin riya siyarên li berava Kentrîes bibirin û paşê jî ji wê derê re derbas bin.
21. Dema Khirisophos û serbazên wî bi asanî çem derbas bûn, Xenophon jî bi lez ket pey wan, dujminan ji tîrsa dorpêçkirinê dev ji beravê berdan û bi çar qewze berê xwe dan rêya ku diçe girikên nêzikî beravê; piştî yûnanî gihîştin ser rê wan berê xwe dan çiyê.
22. Dema Femandarê liqa siyariyan ya 22. Lykîos û femandarê piyadeyên sivik Aîskhînes dîtin ku dujmin awayekî bilez paşve direve, wan jî dan pey wan. Piyadeyên dinê jî dixwastin li wê derê nemînin û ew jî dû wan herin çiyê.

23. Lê belê Khîrîsophos piştî ji çêm derbas bû, şûna li pey siyariyan biçe, gavekî pêşde hilkişiya beravên bilind yê çêm, rikêf bir ser dujminê wan deran. Piştî wan bala xwe dayê ku siyar reviyên û piyadeyên giran ên yûnaniyan ber bi wan tîn, dev ji girikên beravaniyê berdand û ew der vala hîştin.
24. Dema Xenophon lê nihêrî ku aliyê dinê çêm xebat serkeftî encam dide, bi lez vegeriya çû cem serbazên dixwazin derbasî aliyê dinê bibin; Ji ber ku Kardûxî ji bo êrişî yê tewrî dawiyê bikin dadiketî deşt.
25. Khîrîsophos dest danîbû li ser girikan, Lykîosê ku siyarê dujmin dişopand, gelek tiştên ku wan pey xwe hîştibûn bi dest xist (Di nav wan de kinc û kaseyên xwaşik hebûn).
26. Dema meyter û gelşa ligel artêşê ji avê re derbas dibûn, Xenophon ji paş ve vegeriya serbazê xwe dijî kardûkiyan rêk û pêk kir. Ferman da sîtvanan got: bila ew ji aliyê çepê de liqên xwe bikin çar beşên yekrêzî; Bia wisa be ku berê wan û yê fermandarên desteyan li aliyê dujmin, serê dinê yê rêzên wan jî aliyê çem be.
27. Kardûxan dema dîtin ku hejmara paşberan kêmtir maye, bi şeweyê stranbêjî -kî dizane çi digotin - hê jî bileztir êriş kirin. Di wê hengamê de Khîrisophos piştî ku nihêrî her tiştê baş e, hingê piyadeyên sivik, qanîvan û tîrkêş şandin hawara Xenophon.
28. Gava Xenophon ew dîtin, agahdarî şand, û gote wan divê ew avê derbas nebin û li beravê bimînin. Got: <<Dema me dest pê kir em ê derbas bin, ji berava wî alî ji du baskan ve tîrkêş û şervan di nav avê de amade bisekinin, lê di herka avê de zêde pêşde neçin.>>

29. Yê cem xwe re jî got, dema şîrqiniya kevirekî kevkanîyê bê, stranên serkeftinê bêjin û êrişî ser dujmin bikin; paşê dema dujmin ji paş ve bireve û beravê dengê borîzanê bibhîzin, ji aliyê rastê ve vegerin û ser rêzan bişopînin, bê ku hev du nerehetkin, her yek di cihê rêza xwe de bilez ji avê re derbas bin. Kî zû derbasî aliyê dinê be ew ê wek mirovê qehreman bête binavkirin.
30. Li wê derê kê mabûn. Ji ber ku gelek kesên diviya bimana bi tevî ajalên barkêş, bar û giraniyên xwe, hin kes jî bi tevî jinên xwe çûbûn. Dema kardûyan li pêş xwe çend mirov dîtin, bi dilawerî nêzikî wan bûn, kevir û tîr pekandin ser wan.
31. Lê, yûnaniyan bi stranên cengê ve pêşwaziya wan kirin û bi gavên reve rev êrişî wan kirin. Kardûkî pêşberî wan nesekinîn, ji ber ku çêkên wan di şerê çiyayî de (êrişke – bireve AHK) kêr dihatin, lê belê ji bo şerê singvegirtinê ne guncav bûn.
32. Di wê kêliyê de bi bilindbûna dengê borîzanê bibû sedema helatinek bi lez ya dujminan, yûnan jî ji paş ve vegeriyan bi lez û bez ji avê re derbas bûn.
33. Çend kes ji kardûxan pêhesiyan bazdan hatin kêleka çem û çend serbaz bi tîran birîndar kirin; Lê piraniya yûnaniyan hê ew direviyan derbasî aliyê dinê bibûn jî. Hin serbazên pêşwaziya yekîneyên Xenophon dikirin gelekî ji pêş de çûbûn ew jî birîndar bibûn.

Empatî:

Li eniya Kardûyan Şer

Kardukya yan jî Kurdiya nave Kurdistana nûjen e. Aliyekî we deşt, aliyekî dine jî çiyayên asê ne. Çiyayên mina Zagros, Toros û Qafqasên başûrêrojawa nexş û xemlên Kurdiyayê ne. Her ew çiyana mina sengerên xezayî bûne çîh û warên Kurdan û dergûşa şaristaniya mirovahiyê.

Sala B.Z. 401'î, Împaratorê Pers û hevalbendên wî rê li ber deh hezar çarsed serbazên yûnaniyan digrin. Yûnanî bi naçarî berê xwe didin Çiyayên Kurdiyayê.

Kardu, heya hinge ti caran neketibûn bin destên ti dewletan. Ji hingê ve piştta xwe didan çiyayên asê û hebûna xwe diparast in.

Rojekî bê agadariya wan leşkerên yûnan dikevin welatê wan. Ew, wek leşkerê nîzamî şer nakin. Lê belê, bi şere gerîlla fermana serbaz û femandarên yûnaniyan radikin.

Leşkerên yûnanî li ser hev hefteyekî ji Kurdiyayê re derbas dibin. Lê belê ew heft roj, dibin rojên kabûs û xewnerêşka wan.

Dema hejmarek leşkerê deh hezar çarsed kes ketin li nav çiyayên Kurdiyayê, kardû amade nebûn. Ji ber ku gumana tişteki wisa nedibirin. Cara destpêkê gundiyan cînarê deştê êrişî yûnaniyan dikin. Bi şêwazekî şerê gerîla, xalên jar ên yûnaniyan dişopandin û êrişî wan dikirin. Heya ew ji welatê xwe avêtin şopa wan bernedan. Ta ku derbasî Ermeniyayê dibin, her tim tirsê kardûyan di dila wan de ye.

Armanca yûnaniyan bi tenê çûna welatê wan bû. Kardûyan jî dixwast wan ji welatê xwe derxînin.



Rima Teşûb
wan keto! Ev
teşk rût kî ne?

Nizanim?



Dibêjin hin
leşkerên
biyanî ketine
welatê me.

Belê ez benî
Em ê dijî wan şer bikin



Ew roj ji bo kurdûyan
Pir girîng bû. Ji bo biya-
niyan ji wefê derxin se-
ferber dibin.

Deh hezar
serbaz hene

Femandarên kurdiyan ji bo taktîkê şer bi hev re dişewirin.



Em dora wan
bipêçin û qet yekî jî
sax bernedin!

Na, emê aliyekî
vala bihêlin.
Bila ew birevin.








Waye jorê bi êgir
îşaretan didin hev.



Tu ji bo çi nehatî alîkariya me?

Eger em pêş de
neçûyana naha em
hemû jî miribûn.





Bijî
Kurdiya!

Kurd, dest bi şer dikin. Çekên giran bi kar naynin. Ji ber ku ew dizanin di şerê çiyayî de sivikbûn karekî sereke ye. Yek carî ji nişka ve êrişî li ser yûnaniyan dikin.



Bi navê Teşûb,
Mîtra û Varûna
lêdin!


Gidî hawar
Kurd hatin!








Kurdan ji jor ve kevir barandin.






Ew, heya ji Avarêş
derbasnebin em
dev ji wan
bernedin.

Dirêjiya kevanên Karduyan şeş nig, ya tîran
jî sê pî bûn. Bi piyê çepê pêl jêra kewanê
dikir û tîr dipekandin. Bi wan tîrên wan
dikaribûn martal û zirxan jî qulbikin.




Zeûsê Hilovan
were hawara me!



Amîn!

Hêviya me tu yî
Herakles!



Herakles dadikeve
qada şer û dixwaze
palewanê Kurdan re
şer bike.

Dijî Herakles
Rustemê
Kurd
dadikeve
qadê!





Ev kurd him çalak
him jî xurt in






Xenophon, digel kurda pêymanekî girêdide. Kurd yê cinazên leşkerên wan bidin. Ew ê jî gundan neşewitînin û Kurdiyayê gavkî peşte biterikînin û herin welatê xwe.



Kurdan termê serbazan da Yûnaniyan. Wan ji ber qehremaniya miriyên xwe dêlindêzek pêkanîn. Lê belê ser

soza xwe nese kinîn. Ketin gundan û dor û ber talan kirin. Ji ber ku qûtê wan nemabû



Ew neçar,
belengaz û
birçî ne.

Ew ser
soza xwe
nese kinîn.



Heya yûnanî ji Avareş
derbasbûn Kardûyan da
dû wan.

Kardûyan, wek gelek
caran vê carê jî welatê
xwe ji dagirkeriyê rizgar
kiribûn.

Xesenofon, bi xwe ev
serûwena nemir nivi-
sand û diyarî mirovahiyê
kir. Ji ber ked û zîrekiya
Xesenopon hezar car
sîpas!

Κύρου Ανάβασις

Ξενοφών

